

Kiriyariya Roja Nû: ji bona erdên Sûriye û Lîbanê. 35 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 4 lîreyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê; 25 Qemerî.

ROJA NÛ

Dîwan û gerdnendekariya Rojnamê: Bêrût-Bîrc: Weqîf Tabet, Telefona Dîwanê: 74 04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresatêlg: Bêrût-Rojanû.

XWEDÎ Û GERINENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIRXAN

Tefsîra Quranê

123-Her wekî di Mekê de, di gundên din de jî, me gunebarkarên mezin, jorê xelkê kir, da ko ew bi qesda deranfina xelkê jî dîn û diyanetê hîlebaziye bikin; lê belê ew, bi tenê hîlebaziya nefsa xwe dikin; xwe dixapînin, û pê na hesin.

124-Û gava ayetek da tê; ew dibêjin, heta ko Xwedê jî me re jî, mîna bi pêxemberê xwe dike; ayetek wehî ne kir, em baweriya xwe pê na yênin; Xwedê, xweş dizane; ayet û wehiya xwe jî kê re dide, her wekî ew fitne û hîlebaziye dikin; Xwedê wan ve dinê de perîşan û gerpeze bike; û wa dinê de jî, bi ezabekî giran dê biêşîne.

125-Xwedê dil û hişê mirovên ko dixwaze bigihîne riya rastiyê vedike û çav û bihna peyayên ko dixwaze şaş bike, digire û teng dike; û gava jî wan re tête gotin baweriya xwe bînin; mîna mirovên ko jê re hatiye gotin, hilkişê ezmên; bihna van diçike; Xwedê bi vî awayî peyayên ko baweriya xwe ne anîne, diêşîne.

126-Ev e, riya Xudanê tea rast; me ayetên xwe bi tefsîl, şanfî xelkên eqilmend kirine ta ko ew pê bîr bibin.

127-Ji bona wan, li ba Xwedê mala buhuştê heye û Xuda delîl û sermîyanê kar û emelê wan e.

128-Roja ko, Xwedê cin û mirovan wê bicivîne, jî cin û şeytanên re dê bibêje: we xelk xapandine û xistine destê xwe; wê çaxê; jî insanan yên ko bûbûn hevalê şeytanên wê bibêjin: Xudanê me, em bikêrî hev û du dibatin; lêbelê niho em gibane dema ko, te li ba xwe danî bû; Xwedê li wan de vegeşîne û bêje: ne xwe, mala we dojeh e hon tim û daim tê de, wê bîmînin; her hal li gora daxwaza xwe wê çêbike. Binêre... yê fêris û zana Xudanê te ye.

129-Û wilo, em jî ber emelên wan ên xerab, hin zaliman dikin belayê serê hin zalimên din.

130-Gelî komên cin û mirovan... ma me jî we re, jî we - jî nav we - pêxember ne şiyandine; ma wan ayetên me pêş we ne dane; û we bi hatina wê, roja we a piştawiyê agahdar ne kirine... Ewê bêjin: em di heqê nefsa xwe de şehdetiyê didin; me serhişki kiriyê. Belê, jiyîna dinyayê ew xapandin û wan di heqê nefsa xwe de şehdetî dan û gotin: ko ew jî kafîran bûn.

131-Ji ber ko Xwedê ne di xwest, beriya ko pêxember rastiye pêş xelkê bikin, bajarê peyayên nezan û çavgirtî xira bike; 132-Û li gora emelê wan jî

bona her yekî jî wan cih û mertebe- beyek heye; Xudanê te jî kirina wan ne bê hay û xeber e.

133-Û yê dewlemend û dilovan Xudanê te ye, û ko wî xwest sefê we diçe û li gora daxwaza xwe, ew sefêkî din tîne dewsa we, herwekî wî, hon jî çêliyên sefêkî din da gibaştin.

134-Roja piştawiyê, her wekî hatiye gotin; bi ser we de, wê bê û hon ni karin wê bisekinînin. an bidin bi gûnda vegeandin.

135-Bêje, nijadê min, ko we dil kir, li gora daxwaza xwe bimeşin; lê belê ez, li gora emrê ko jî min re hatiye dayîn gavê xwe davêjin; honê di dawiyê de, xeleta xwe seh bikin; honê bîbînin, di mala axiretê de, li buhiştê qedrê kê wê bête girtin. Zalim tu caran na gehin felatê.

136-Ew (mişrik) jî zad û terş û dewarên xwe, behrek hiltînin û dibêjin ev para Xwedê ye û behreke din hiltînin û dibêjin evya pûtên me ye, û para Xwedê didin rêwîngî û belengazan û ya pûtan; didin xidmetkarên pûtanxaneyan; û heke para ko jî bona Xwedê hiltînin tîrî hewcedariyê na ke, jî para pûtan tiştêk hîlnayênin; lê heke para pûtan tîrî hewcedariyê ne bû; jî para Xwedê distînin û dibêjin; Xwedê dewlemend e; ne muhtacî van tiştên ye; qerarên wan wilo kirê û hêker bû.

137-Dîsa, bi vî awayî şeytan û xidmetkarên pûtan ew xapandin, û wan jî tîrsa tûnebûn û belengazî yê û bi xeyreta nezaniyê, zaroyên xwe kuştin; jî ber ko şeytên û xidmetkarên pûtan, qelandin û edimandina wan dixwestin; heke Xwedê dil bikira, wan ev tişt ne dikirin; jî ber vî yekê, dev jî wan berde; bila li gora eqilê xwe bimeşin.

138-Mişrikan li gora eqilê xwe digot: ev zad û terş û dewarên ko para pûtên me ne, jî me re heram e û ew bitenê jî bona xidmetkarên pûtanane; û li van heywana siwar bûne jî; jî me re heram e û di şerjêkirina hin heywanan de, navê Xwedê na yênin; ew, bi van tiştan derewan dikin û derew bi all Xwedê ve didin; jî ber vî yekê, Xwedê wan de biêşîne;

139-Û wan got: heke sexelê wan dewaran (Behîre û Saibe) sax dizê jî me re helal, lê jî jî-nên me re, herame; û heke berê wan mirî dizên, tê para jin û mîran hene, tev de jê dixwin; ew pê derewan dikin, û cezayê xwe dê bibînin; Xuda fêris û zana ye.

140-Yên ko jî nezani û ehme-qiya xwe keçên xwe kuştine, û tiştên ko Xwedê helal kiri bû; jî xwe re kirine heram, dîn û dinya xwe xira kirine, û ketine rêke xwar; û ne gihane rastiye.

141-Xwedê ye ko rez û bîstanên tîr mîw û lem û dar, û darên xurmê û zadên erdê yên ko tama wan bi çend texlîta ne, û zeytân û hinarên ko mîna hev û du xuyani dikin; lê lezetên wan jî hev dîr in, dan gibaştin; gava ew her û fêkiyên xwe didin; jê bixwin û dema paleyî û çîna wan de, zekatê wan bidin; lê belê ziakeriyê me kin; jî ber ko Xwedê, jî ziakeran, hez na ke.

142-Û jî dewaran, (hêştiran) hin hene ko barhildigirin; hin tîne şerjêkirin û jî mûyên hînan ber û ferşên rayexistinê, tîne çêkirin; jî tiştên ko Xwedê rizqê wê kiriyê, bixwin û mekevin şopa şeytên û bizanin ko ew dijîminê wê êşkere ye.

143-Terş û dewar heqî cot û heqî celeb in; jî pezê spî cotek; mî û beran; jî pezê reş cotek; bizin û nêrî; Bêje: ma Xwedê mî û bizin; an beran û nêrî heram kiriyê? an goştê berê di wan; yê hêj di zikê diya xwe de ne! Heke hon mirovên dilpak in, ka jî min re li ser heramkirina wan emrektî şanfî min bidin.

144-Xwedê cotek deve, nêr û mî û cotek dewarê reş, ga û çêlek da afirandin; Bêje: Xuda goştê nêr an meyên wan heram kiriyê; an goştê berê di wan, yan ko hêj di zikê diya xwe de ne; ma gelo gava Xwedê xwarina goştê wan heram dikir hon lê bûn? Ma jî kesê ko derew bi all Xuda ve dide û dixwaze pê nezanan şaş bike, jê zalimtir ki ye; Xwedê zaliman na gihîne riya rastiye.

145-Pêxemberê min, bêje: ez di emr û wehyên Xwedê de, dibînin ko bitenê goştên heywanên mirî, xwîna heywanên şerjêkirî ya ko rijîya ye, û goştê beraza, yên ko mirdar in, û goştê heywanên ko ne bi antna navê Xwedê; lê bi antna navekî din, hatine şerjêkirin, yên ko fişq in, heram e; fîca, kesê ko bê dilxwîyê, lêbelê jî hewcebûn û neçariyê, hişk jê xwar, bila bizane ko Xwedê dilreha, di gunehên heçareyan dibore.

146-Me jî cuhiyan re goştê heywanên yeksim, mîna hesp, qantir û ker û bezê pez û dewarê reş heram kiriyê, jî duhnê ko bi rûvî, bestî û goştê piştî wan ve zeliqiyê; pê ve; me bi vî awayî cezayê serhişkiya wan daye; û binêre, em qedrê gotîna xwe digirin.

147-Heke wan, derew bi all te ve dan; bêje: Xudanê we ditnêrm û keremkar e û qenciya wî mezin e; lêbelê qewmên zalim bi destûra wî, dê bîne şandin.

148-Bêşik, mişrik wê bibêjin: Xwedê bixwesta; me û bavê me; pûtên xwe ne dikirin hevberê di wî, û me ne digot filan û filan tişt jî me re heram e; lêbelê her wekî ew niho te li derewan di-qelibînin; beriya te jî derew bi all pêxemberên Xwedê ve da bûn; û jî ber vî yekê lezeta ezabê me, tam kirin; Bêje wan: heke destê we de kitêb an hicetek heye, de şanfî me bikin; ne xwe, destê wan de, tiştêk nîne; we daye pey xiyalekê; û hon hema derewan dikin.

149-Bêje: Kitêb û hicetên ko dil pê qawî dibê, li ba Xwedê ne; heke wîy bixwesta, wîyê hon bigihanda riya rastiye.

150-Bêje: de şahidên xwe bînin da ko şehdetiyê bidin û bêjin ko Xwedê ew tişt heram kirine. Pêxemberê min; heke jî wan hin rabûn û jî derewan şehdetiyê dan, tu me lestedqdarê wan; me de pey mirovên ko li gora dilxwaza xwe dikin; derew bi all ayetên me ve dane û baweriya xwe bi axiretê na yênin, û Xwedê û pûtên xwe weke hev digirin.

151-Bêje: werin, ezê jî we re tiştên ko Xuda heram kiriyê bidim zanin; tu tiştî me kin hevber û hempayê di wî; qedrê dê û bavê xwe bigirin, û qenciye bigi hînin wan; û jî ber belengazî û tunebûnê zaroyên xwe me kujin; emê rizqê we û wan bî-din; ne bi dizîka û ne jî bi awaktî eşkere zinayê me kin; xelkê me kujin, ev tiştêkî heram e; meger ko sebebek hebe; mîna di cihadê de, ev in emrên Xwedê heye ko hon tedigehî û pê bîrewer dibin.

152-Malê sêwîyan me xwin; malê wan têkilî malê xwe me kin; meger ko ev tişt jî bona parastina mala sêwîyan çêdibe û heta dema mezînbûna wan; vî gavê vî tiştî li gora heq û edaletê çêkin, û pê armanca we divê qencî û silametiya mala sêwîyan be; di dan û standîne de, mid, kil û gihîna xwe rast biptîvî û bikêşin; em barê tu kesî jî taqeta wî bêtir na kin; di hikm û şehdetiyê de, di heqên mirovên di we de jî, li gora edaletê hikim bikin; li ber Xwedê û mirovan; li ser gotîna xwe bîmînin; qerara xwe me şikînin; ev emrên Xwedê ne; dil û çavê xwe vekin û pê bîr bibin.

153-Û ev e, riya min a rast; bikevin ser riya min a rast; me kevin ser şopên din; ta ko hon jî riya Xwedê, jî riya rastiye dîr me çin; Xwedê emrên xwe şanfî we daye, heta ko hon jê tirsîyar bibin û riya xwe şaş ne kin.

154-Berê jî, me hikmên xwe şanfî xelkê da bû; me kitêb da Mûsa; ya ko bi timamî arîkariya qencîkeran dikir, û şanfî her tiştên dîn û dinyayê dida; wê kitêbê riya rastiye û rehma Xwedê

pêş lawên Israfil dikir; ta ko ew pê baweriya xwe bi roja piştawiyê û bi veqera xwe ba Xwedê bînin.

155-Û ev, Qurana ko me da dahatin kitebeke hejau giranqîmet e; li gora hikmên di wê bimeqîn û bêmriya wê me kin; heta ko hon bigihin rehîm û piyariya Xwedê.

156-We gotî bû: Tewrat û Incîla ko ji cuhî û filan re dahatiye bi zimanine biyanî bûn, û me ne dikarî bû wan seh bikin; heta ko hon dîsa wîlo me bêjin, me Quran bi zimanê we ê erebî nazil kiriye.

157-Da ko hon me bêjin, heke ji me re kitebek nazil bibiwa, me ji wan bêtir xeyreta rastiye bikişandana; ji we re, (xelkê Mekê); bi zimanê we ê erebî, Quran dahatiye; hikmên Quranê riya rastî û rehmetê pêş we dikin; ma ji mirovên ko rûyê xwe ji hikmên Quranê badidin û derew bi alf wan ve didin, zalimtir kî ne? Emê yên ko dest ji ayetên me dikişînin û bêmriya me dikin, bi ezabekî giran bişînin.

158-Ma xelkê Mekê çavneriya çî: tiştî dikarin bikin? hatina melyaketê ko rûhê wan wê bistîne; an jî aliye Xudanê te emrê eşandin û perîşaniya wan da tê; an ne nîşanên dawîya cihanê eşkere bînin; mîna halatîna rojê ji rojavayê! Yên ko baweriya xwe ne anîne, li gora emrê Xwedê ne meşiyane, dîn û dinya xwe wînda kirine û piştî aqîqarûna delîletên xelaseka dinê, heke baweriya xwe tînin; divê ew bizanin ko qencî û baweriya wan 3df bi kêrî wan nayê. Bêje: hon di hêviyê de bîmfînin û bînerînin; em jî di hêviyê de ne.

159-Tu, xema peyayên ko li ser dinê xwe bêtîfaqî kirine û ji xwe re rêke din bijartin, me xwe; qencî û xirabiya karê wan, di destê Xwedê de ye; Xwedê daxwaz û qerara xwe, wê şanî wan bide.

160-Yê ko qencî kiriye, jê re deh car bêtir qencî heye; û yê ko xirabî kiriye, bi qasî wê xirabiye, dê bête eşandin, ne jê kêmîtir û ne jî jê zêdetir, û di heqê wan de, zilîm nayê kirin.

161-Bêje: Xudanê min, ez kirim ser riya rastiye.

162-Xwedê ez kirim ser dinê miletê Brahmî ê pak û qaim; Brahmî tu kesî, ne kirî bû hevber û hêmpayê Xwedê.

163-Bêje: nîmêj, qurban, aytn, jiyîn û mîcina min yê Xwedê ne; destê wî de ne, yê ko Xudanê erd û ezmana ye. Hevber û hêmpayê wî nînc; û bi emrê wî, ez bû me misilmanê pêşîn.

164-Bêje: Ma çawan ez dikarim dil bikim û ji Xwedê pê ve, yê ko Xudanê her tiştî ye; xudayek bixwazim? Kedê her nîseki jê re ye, û tu kes barê yekî din hilnagire; honê di roja piştawiyê de; wê veqerî ba Xudanê xwe; û ew li ser tiştên ko we pê bi ya hev û du ne dikir, hikmê xwe ê bide.

165-Û wî ye ko hon danîne dewsa nijadên borî, û mertebeyên hinên ji we, ji yê din bîlîndtir kiriye, û bi nîmeta ko da bû we; hon diceribandî; binêre, Xudanê te gunehkaran lez û bez diêşîne; û di gunehên mirovên qenc dibore û wan digihîne rehîm û piyariya xwe.

Alî Xwarza Kalo Rebeno.

Wardîana qewitî, xweş Wardîana, Bazîdiyê gundê di filana, Çema Bişîriyê bi mîrgan û çîmana, Kêndê Bazîdê cih nijdan û celaliyana.

Çî dema Hemzê konê di rêş lê vedana, Digerfînt li koçkan û dîwana. Sibeyekî, Hemzê serê xwe li ber konê di rêş dihilîni, Dûrbînê li ber çavê xwe di gerîni.

Tewqa siwarekî li binê mala wê dibîni, Û ewî suwarî bi Îsivê Gozalê digebîni.

Gott: Temo, lo lawol Egîdo, lo lawol

Dê tu lez ke, bilezîne, Xwe bi extexanê re bigihîne. Kûçek Stenbolê ji extexanê biderîne,

Û in bi çar qayîşa li piştî kûçek Stenbolê bişidîne,

Li ber qerpûza zîni biçîkilîne ortek û karzûna,

Û xwe di binya mala re bigehîne. Siloxdana vî suwarî ji min re bîne.

Heke siwarê me xuya bit, bêje: «Babê min Hemzê gelek selamê û kelamê qedîm li ba te kirine», Û bêje: «Hal û Hewalêd qaçaxêd me li Zozanê jorî çî ne?» Heke siwarê celaliya bit: Malêd me dî cilpa ne».

Ditirsînê wê sibeyê talanekî ji xwe re bikişîne.

Tamê lez kirî lezandi ye, Kûçek Stenbolê ji extexanê deranti ye.

Zîni bi çar qayîşa li piştî şidandiye,

Pê xwe li rikêba avêti ye, Xwe li bînyê mala re gihandi ye,

Bêrê xwe dayî. Ewî siwarî İsiyê Gozalê bi eynî ye.

Gazî kirê: İsiwo, lo, lawol Gava çavê min bi çavê te keti ye,

Rayê piştî min qeti ye; Kezeba dilê min heli ye.

Ji min re bêje: «Hal û hewalê di qaçaxêd me li zozanê jorî çî ye?»

Wey la li min diranê! İsiwî gotê: Temo lo, lawol

Şikira mîrê mezin be Nanê me biriyê be,

Dewê me qeliyê be, Haşîya konê me sot be;

Navê qaçariyê li mala Şêrê, li darê dinê qet tu ne be!

Şevêdî na şevadî, Emerê Yûzbağî digel Gidî babê bînbagî,

Mixoyê Gozalê tabûreki eskerî enetolê bi ser bira alêd me girtî ye.

Bist û pênc kurfî law destê wan bi darê kelemçê da ye;

Û berê wan da ye Erzîroma rengîne.

Behsê kuştîna wan heye, Û berdana wan qet tu nîne.

Gava Temê wa bihistiye, Calabê kûçek Stenbolê zivirandiye,

Qesta kona mezin kiriye, Ji babê xwe re gotiye:

Erê, babo, hatina vî siwarî bê oxirî ye;

Û ewî suwarî İsiwê Gozalê bi eynî ye.

Strana Omeriya

Smailê Xelîl

Kalo, rebeno, Zozan bişewitîn; Belê ho ê Kalo, Zozan wa bi ci ye? Hezar û heft sed siwarê di Zilan û Heydera xalib Axa kirin karê xwe ne. Diçin, xirabkin, xirab-Zila şewitî û Mehê, kekê Gewrê dikujîn siwarê zerdêkê.

Delo, ho ê Kalo da loto; xwarzî te ye. Kalo rebeno, zozan bişewitîn; Delo, ho ê Kalo.zozan î şin e.

Hezar û heft sed siwarê di zilan û Heydera kirin û kom kirine:

Diçin, xirab bikin, xirab-Zila şewitî û Mehê, kekê Gewrê, dikujîn siwarê zerdêkê.

Xeyret û namûsî li dor te nîne. Delo, ho ê Kalo da loto;

Kalo, rebeno, zozan dişewitîn; Belê ho ê Kalo, Zozan bi semaç e.

Hezar û heft sed siwarê di Zilan û Heydera xalib Axa kirin bi tîfaç e.

Diçin, xirab bikin, xirab-Zila şewitî û Mehê, kekê Gewrê, bikujîn siwarê zerdêkê.

Bira Elah û İman Elah, heko tu neçî, arî Mehê, kekê Gewrê, ne kî, Erê dê xwe ji te berdîin bi tîlaç e.

Delolo, Kalo;...

Heso Rebeno.

Heso Goyîno, bayê sibê li min ra bû, Şehîdî şîhadê Hesê Balo gelek hebû.

Li niv meydandî Çîrp li ber axayê xwe peşê bû.

Rabe, siwar be, bila malkekî mîrata bê, Da nebêjin Koçka wî mîrata Hellîlê bi-law na bê.

Kî digo Heso êkane çêkir, Kîbara sibê, zîne hemdantî lê kir.

Şehîdî şîhadê Hesoyê Balo gelek hene. Serê xwe bi gorîya serê axê kir.

Ezê bi gîrê Mehmedana şewitî ketim. Ji giranî gîr gûnik e.

Ferho got: Bra, ka namûsa te kirî. Bra min wê çawa namûs na kirî.

Min wê li şelîta kona hesirandî. Eza rabûne ser rikêbekî.

Min wê rima li darê qolincê da. Min got: Eve heyfa Hesê Balo, qumendare ser bîlaka.

Ezê giranî ketim, giranî û peşê da. Ferho got: Bra, ka namûsa te kirî.

Çawa wê Bişêrê Çeto nivê siwara ferîta kirî.

Min wê li şelîta kona asê kirî. Ezê rabim ser rikêbekî.

Min wê rimekî li darê qolincê da. Min got: Eve heyfa Hesê Balo, xulamê banê min rebenê,

Xulamê ji xulamana t zêda.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

Erê, babo, Doskiya revî, min ne hêla. Sed heyf û mîzab in: Sîso kuştî hêj çîl e.

De... lo, lo, gidî lo Smailo hegran, Talat bişewitê bi mîrg û kani; lê diçêre mehîn û ciwanî; şevê nivê şeva Mihemedê gurtî, şewîr û mişewîrê kuştîna Smailê Xelîl, li mala Xengo danî; şand metîka xwe Helikê anî; li ser qesra Smail, sekîni Helikê; û teşîta xwe derisî; qerara nêrdewanê gurtî, ji Mihemedê gurtî re anî; Mihemedê gurtî qerara nêrdewanê bir û çûye çiyayê Mazî; nêrdewanek çêkir û bi xwe re anî: jî nivê şevê û pê ve, li ber qesra Smailê Xelîl danî; bi nêrdewanê ve, hilkişîya ser qesra Smailê Xelîl; demançê qeredax ji qîbûrê deranî; û li ser qehfê Smailê Xelîl danî; heyfa kevîn û nuh, bi destê xwe hilanî...

Lawê gurtî, welêh, ez te na kim; tu bi şex bî, ez te tewaf na kim; tu bi gu bî, ez te di ber serê xwe da na kim; mî go: ezê serê sibehê; herim Smailê Xelîl, jî xew rakim; ezê rahêjim misîn û leganê; ezê avê li desta kim; ezê bişînim Mûsil û Kerkûkê, ebakê bînim, di nav mîla kim; bişînim Sîteymaniyê xencerkê bînim, di ber ra kim; mî go qey, ezê Smailê Xelîl li Talatê bi zava kim; bi Zawayê şê roju kim; mî go Smailê Xelîl xortekî gelekî lê hêja ye; ezê li Talatê bi axa kim; ezê bi axayê Omeriya kim; min ni zanî bû, ko ezê rahêjim laşê Smailê Xelîl, di mezelê binya mala kim; Smailo Xeyra, bejna Smailê min zirav e, mîna tayê ketê, şin dibî di Talatê, li mîlê xelî, mî di laşê smailê xelîl, danî-ne gasîna dêrê, li ber mîzgefî; gîriya kafîr û misilmana bi halê min û te... lê

De... lo, lo, gidî... lo Smailo; bejin zirawo, nav qendîlo, Smailo hegran, jî Talatê û heya Sîlê; ziyala xwe didimê; berf û baran bi kulî lê; diya smailê xelîl jî aliye Mîdyatê, jî gîlî lê; laşê smailê xelîl danîne gasîna dêrê, ber mîscidê... gîriya kafîr û misilmana bi halê min û wî lê; qesra smailê xelîl bîlînd e, li Talatê sera, sera; lê dînerim li kuteka, li şîbaqe, li pencera; Mihemedê gurtî, kero jî wan kera, çawa te laşê smailê da ber xenceral....

Sibriyê Serhelî

EZÊ LI SERSIMLÊ

Ezê li ser similê ketim, mehalê seran û bihar e. Li ezmana qîrîna we, mîratê, di Tîgara. Li erdê qîrînê di Exsîra û nalînê di brîndara. similê xopan we bi gir e. Mîrata Tîgarê hat ser de gira. Û eşîret hatin û çarnîkarê gîrgîr e. Heyf û mîzabîni destê Tîgariya û Bazîya. Gîrtine û dana ber xencera. Mîrata similê we bi nîwal e, Û çarnîkarêd wî eşker gîrtin bi trombêla. U gazî eşîreta kirin: Werîne mala Û jî xwe re bibin erz û eyala. Simîla rengin li erdê rasî e; Eşker destê lawê Tîgariya gîrtin Û ser xotrê hêlemîst e.

